Voluntary Assisted Dying
QUEENSLAND

# Kurmancî

## Otenazî ya bi dilxwazî ye

Queensland Government

Heke hûn paçvekerek hewce bin, ji bijîşka xwe yekî bixwazin. Ew bêdirav e.

Ji bo alîkariya xwendina vê bangaziya agahiyê:

- Hêjmara telefonê ya Xeta bêdirav a Ragihîna Pirçandî: 1300 079 020
- Xizmeta Wergerê (Alîkarî bo Îngilîzî): 13 QGOV (13 74 68) û daxwaziya paçvekerek bikin
- Xizmeta Werger û Paçvekerê. 13 14 50

# Peyvên dijwar

Li nav vê pirtûkê de hin peyvên dijwar hene.

Ev carê yekem e ku em peyvekî dijwar dinivîsin:

- ew peyvan bi rengê **şîn** xwe xuya dikin
- em li wateya peyva dijwar dinivîsin.

# Di der barê vê pirtûkê de

Ev pirtûka ji hêla Queensland Health ve hatiye nivîsandin.

Ev pirtûka di der barê **otenazî ya bi dilxwazî ye.**

*Otenazî ya bi dilxwazî tê wateyê ku hin mirovan ji ber ku li dawiya jiyana xwe xwebixwe bînin dikarin alîkarî bixwazin. Tenê mirovên ku pir nexweş in û li nav 12 mehan kurttir de ê bimirin dikarin ji bo dawîanîna jiyanên xwe alîkarî bixwazin.*

Ev pirtûka dikare alîkariya we bike ku hûn bizanibin ka otenaziya bi dilxwazî çi ye.

Ev pirtûka ji bo mirovên ku dixwazin di der barê otenaziya bi dilxwazî de zêdetir tişt bizanibin hatiye saz kirin.

**Hûn dikarin kesek bibînin ku alîkariya we bike:**

- li vê pirtûkê bixwînin
- bizanibin ku ka ev pirtûka di der barê çi de ye
- agahiya zêdetir fêr bibin

Dibe ku hin mirovên ku di der barê mirin û wefatê de xwediyê baweriyên cuda nin li vê pirtûkê ji bo xwendinê acizker bibînin.

# Divê ji bo xwe bigihînin li otenaziya bi dilxwazî çi bê kirin

*Xwe gihandin ev dem e ku hûn fêr dibin ka hûn dê çawa bi riya bikaranîna otenaziya bi dilxwazî bikaribin bimirin*

Hûn dikarin otenaziya bi dilxwazî vebijêrin

Hûn bi xwe ji bo otenaziya bi dilxwazî daxwazek dikin.

Tu kesên din nikarin bi navê we daxwaziya otenaziya bi dilxwazî bikin.

Tu kesên din nikarin ji bo otenaziya bi dilxwazî bi we bidin xwestin.

Hûn dikarin li daxwaza xwe ya otenaziyê her wextê bidin sekinandin.



## Bijîşka we û otenaziya bi dilxwazî

Divêtiya bijîşka we nîne ku otenaziya bi dilxwazî bîne li cih



Heke bijîşka we otenaziya bi dilxwazî pêk neyne, hûn dikarin li **Xizmeta Palpiştiya bo Otenaziya bi Dilxwazî ya Queensland bigerin (QVAD-Palpiştî)**.

*Xizmeta Palpiştiya bo Otenaziya bi Dilxwazî (QVAD- Palpiştî) dikare alîkariya we bike ku hûn bijîşkek ku otenaziya bi dilxwazî pêk tîne bibînin*

Hûn dikarin li QVAD Palpiştî ji dûşemê heta înê, ji saet 8.30 serê sibehê- 4piştê nîvro bigerin

**Epeyam:** QVADSupport@health.qld.gov.au
**Telefon:** 1800 431 371

# Kî dikare xwe bigihîne li otenaziya bi dilxwazî



**Bitenê heke xwediyê van mercan bin hûn dikarin xwe bigihînin li otenaziya bi dilxwazî:**

- heke hûn bibin xwediyê nexweşiyek ku li nav 12 mehan hindiktir de bibe sedema mirina we
- heke hûn bibin xwediyê nexweşiyek ku dibe sedema êşên giran ên laşî an derûnî yên we yên ku hûn nikarin pê re serederî derkevin
- heke hûn bibin xwediyê nexweşiyek ku nayê nojandin û tu car êşa wê naqede
- heke hûn dikaribin biryarên xwe bistînin
- heke daxwaza we hebe ku hûn xwe bigihînin li otenaziya bi dilxwazî.
- heke hûn ji 18 salî mezintir bin
- heke hûn li Queensland'ê dijîn û rûniştvana li wir in

**Heke wan rewşên rêzkirî bi we re hebin hûn nikarin xwe bigihînin li otenaziya bi dilwazî:**

- heke hûn bibin xwediyê nexweşiyek derûnî lê ew nexweşiya li nav 12 mehên dahatî de nebe sedema mirina we
- heke hûn bibin xwediyê astengiyek lê ew nexweşiya li nav 12 mehên dahatî de nebe sedema mirina we
- heke hûn nikaribin biryarên xwe bistînin
- heke hûn ne nexweş bin.

# Tiştên ku ji bo xwe gihandina otenaziya bi dilxwazî bên kirin

Ji ber ku hûn xwe bigihînin li otenaziya bi dilxwazî divê hûn ji bo wê sê caran daxwaz bikin û li du bijîşkan bibînin.



## Daxwaza yekem

Daxwaza yekem ew e ku hûn bo otenaziya bi dilxwazî ji bĳişka xwe dipirsin.



## Nirxandina yekem

Nirxandina yekem ew e ku gava:

- Bijîşka we ji we re dibêje ka ku hûn dikarin an nikarin otenaziya bi dilxwazî bidest bixin.
- Bijîşka we ji we re agahî dide da ku hûn bikaribin biryara xwe bidin ka ku hûn dixwazin xwe bigihînin li otenaziya bi dilxwazî an na.



## Nirxandina şêwirandinê

Nirxandina şêwirandinê ew e ku gava:

- Bijîşka we ji we dixwaze ku hûn li bijîşkek din jî bibînin.
- Bijîşka duyemîn ji we re dibêje ka ku hûn dikarin li otenaziya bi dilxwazî bidest bixin an na.



## Daxwaza duyemîn

Daxwaza duyemîn ew e ku:

- Hûn daxwaza otenaziya bi dilxwazî bi awayek nivîsandî dikin.
- Bijîşka we formek dide li we da ku hûn bikaribin li we pêk bînin.
- Du kes li we temaşe dike ka ku hûn li formê îmze dikin an na.
- Heke hûn nikaribin li formê îmze bikin, kesek din dikare li wê ji bo we bîne li cih, tenê bixwazin bes e.



## Daxwaza dawî

Daxwaza dawî ew e ku:

- Hûn li otenaziya bi dilxwazî cara sêyemîn ji bijîşka xwe dixwazin.
- Divê li navbera daxwaza we ya yekem û dawî de hindiktirîn neh roj hebin. Ev dem ji bo we peyda dike ku hûn arîxen bin ka ku hûn li otenaziya bi dilxwazî dixwazin an na.
- Hûn dikarin bi riya bikaranîna peyvan, bi riya nivîsandina peyvan an nîşandana bi destên xwe an bi awayek din ji bijîşka xwe bipirsin.



## Nirxandina dawî

Nirxandina dawî ew e ku:

- Bijîşka we ji we re dibêje ka ku hûn hê dikarin otenaziya bi dilxwazî bidest bixin an na. Bijîşka we ê bipişkîne ka pêvajo bi awayek rast hatiye pêk anîn an na.



## Biryara birêvebirinê

Biryara birêvebirinê ew e ku:

- Hûn hildibijêrin ka ku hûn dixwazin **bûjena otenaziya bi dilxwazî çawa bê birêvebirin**.

  *Bûjena otenaziya bi dilxwazî, ew derman e ku dibe sedema mirinê.*
- Du vebijêrkan guncaw in:
  - hûn dikarin li bûjena otenaziya bi dilxwazî xwebixwe hilbigrin
  - hûn dikarin li bijîşka xwe vebijêrin da ku li bûjena otenaziya bi dilxwazî bide li we.
- Bijîşka we ê bi we re di der barê vebijêrka baştirîn a bo we çi ye biaxive.

# Jîvana kesa ragihînê



Heke hûn biryara birêvebirinê bidin divê hûn kesek bo ragihînê **vebijêrin**.

*Kesa bo ragihînê ew kes e ku bo beşa dawî ya otenaziya bi dilxwazi ya we alîkariya we dike. Divê ew 18 salî bin an jê zêdetir bin.*

Dema jîvana kesa bo ragihînê ew e ku:

- Hûn li yek vedibêjêrin da ku bibe bo we bibe kesa bo ragihînê. Dibe ku ew bibe hevjina we, yek ji malbata we, hevalek we, nihêrvana we, karkera tendurisutiyê an kesek ku baweriya we pê tê.
- Kesa bo ragihînê ya we, gava hûn mirin, ê li agahiyê bide li bijîşkê.
- Heke piştî mirina we bûjenek zêde ya otenaziya bi dilxwazî ya we mabe, kesa bo ragihînê wê dizivirîne li dermanxaneyê.

# Dawîkirina jiyana we



**Heke hûn bixwazin li bûjena otenaziya bi dilxwazî xwebixwe bidin li xwe.** Demanfiroşek ji Xizmeta Dermanan ya Otenaziya bi Dilxwazî ya Queensland'ê (QVAD-Dermanxane) dê bûjenek bo otenaziya bi dilxwazî ji we re peyda bike da ku hûn jiyana xwe dawî bînin.

**Heke hûn ji bijîşka xwe an hevşîreya xwe bixwazin da ku bila bûjena otenaziya bi dilxwazî ew birêvebibin**, bijîşka we an hevşîreya we dê li bûjenê bidin li we da ku dawiya jiyana we bînin, lê divêkesek din li wê temaşe bike.

# Piştî mirina we

## Berhewakirina bûjena otenaziya bi dilxwazî

Berhewakirina bûjena otenaziya bi dilxwazî ew dem e ku:

- Heke hûn dixwazin li bûjena otenaziya bi dilxwazî xwebixwe birêvebibin, divê kesa bo ragihînê ya we tiştên ku jê mayî bizivirîne li dermanxaneyê. Ew dê bên gotin ku bi awayek çawa bên pêk anîn.
- Heke hûn bixwazin bijîşka we an hevşîreya we li bûjena otenaziya bi dilxwazî birêvebibin. Bijîşk an hevşîreya we dê tiştên ku jê mayî berhewa bike.

## Danezana mirinê



Bijîşka we dê ji Lijneya Çavlêgrandinê ya Otenaziya bi Dilxwazî re bibêje ku hûn mirine.

## Bawernameya mirinê

Bawernameya mirinê parçeyek kaxiz e ku qala awaya mirina we dike.

Bawernameya mirinê dê qal bike ku hûn ji ber nexweşiya xwe yê eslî jiyana xwe dest pê daye (mînakî, penceşêr).

# Qalkirina otenaziya bi dilxwazî



Dibe ku qalkirina mirinê an otenaziya bi dilxwazî dijwar û xemgîn be.

Mirovan dixwazin tehma dema wan ên mayî derxin.

Vebijêrkên ku mirovan dikin pir kesane ne û bo wan pir girîng in.

Qalkirina daxwazên we alîkarî dike ku malbata we û nehîrvanên we tebigihêjin.

Gava em qala otenaziya bi dilxwazî dikin, tiştê herî dijwartir ew e ku hûn nizanin hûn dê ji ku dest pê bikin.

Li vir hin ramanan hene:

- "Qalkirina wê dijwar e, lê wateya wê bo min gelek e."
- "Me di der barê piştî mirina min dê çi biqewime de jixwe axift. Gelo em dikarin di der barê otenaziya bi dilxwazî de zêdetir biaxivin? "
- "Ez bi bijîşka xwe re diaxivim. Bijîşka min ji min xwast ku ez di der barê tiştê ku ez dê bikim de bifikirim. "

# Palpiştiya li malbata xwe û nehîrvanên xwe bike



Piştî mirina te, dibe ku malbata te û nehîrvanên te xwe xemgîn an bixem hest bikin.

Ji ber ku hûn palpiştî li wan bikin, gelek rêyan hene.

Bijîşka we dikare alîkariya malbata û nehîrvanên we bike da ku ew palpiştiyek bicih bidest bixin.

Ji bo alîkariya zêdetir, ew dikarin QVAD-Palpiştî bigerin:

**Epeyam:** QVADSupport@health.qld.gov.au
**Telefon:** 1800 431 371

## Lijneya Çavlêgerandina Otenaziya bi Dilxwazî çi ye?

Karê wan ew e ku ew ewlehî dibin ka zagonên di der barê otenaziya bi dilxwazî tên bicih anîn an na.

## QVAD-Palpiştî çi ye?

Karê wan ew e ku:

- ew agahî didin li kesên ku daxwaza otenaziya bi dilxwazî dikin û palpiştiya wan dikin
- ew alîkariya li kesên ku li otenaziya bi dilxwazî dixwazin dikin
- ew mirovan radigihînin li xebatkarên û xizmetên tenduristiyê yên ku otenaziya bi dilxwazî pêk tînin
- ew alîkariya xebatkarên ku otenaziya bi dilxwazî pêk tînin dikin.

## QVAD-Dermanxane çi ye?

Karê wan ew e ku ew arîxen dibin ka bûjena otenaziya bi dilxwazî bi awayek ewlehî tê zivirandin û berhewa kirin.

Ew li we arîxen dikin ku bijîşk an hevşîreya we dizane bi awayek çawa bûjena otenaziya bi dilxwazî bikar bîne.

# Hilgirtina alîkariyê



Dibe ku hin kesan bi xwendina wê xemgîn bibin. Heke xwendina wê li we an kesek din xemgîn bike û hûn hewceyê alîkariyê bibin, ji kerema xwe yek ji hejmarên telefonên li jêr bigerin.

- Navenda Tenduristiya Derûnî ya hemû Çandan Wedihevîne ya Queensland'ê (Queensland Transcultural Mental Health Centre) 3317 1234 an 1800 188 189 (ji derveyî Brisbane) an 1300 64 22 55 (24/7) bigerin
- Koma Başbûna Gerdûnî (World Wellness Group) (palpiştiya pirçandî) 1300 079 020 bigerin

Ji bo agahiya û palpiştiya zêdetir serî bidin https://www.qld.gov.au/health/mental-health/help-lines.